Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1325 16-Mijdar-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Kampên koçberên Efrînê li Tepqayê ji bo zivistanê tên nûkirin û amadekirin

Navenda Nûçeyan

**Hevserokê Kampên Koçberên Efrînê yên li Tepqayê Mistefa Reşîd da zanîn ku du kampên gel yên bi navê Aştî û Azadî hene û amadekariya vekirina yê 3'yem tê kirin da ku gelê di dibistanan de derbasî wir bibin û got, "Nûkirin û avakirina binesaziya çadiran ji bo zivistanê tê kirin."**



Bi destpêkirina desteserkirina li ser Sûriyê ji aliyê HTŞ'ê û hemû komên çeteyan ve û bi rûxandina Rêjîma Baas re. Di 2'ê Kanûna Pêşîn a 2024'an de komên çeteyan bi rêvebirina hikumeta veguhêz a niha, herêmên Şehbayê û Til Rifet jî dagir kirin. Her kes dizane ku herêma Şehbayê ji aliyê şervanên YPG'ê û YPJ'ê ve di 2016'an de hate rizgarkirin. Piştî dagirkirina Efrînê di 2018'an de gelê Efrînê li herêma Şehba û Til Rifet bicih bûn û 7 sal ji berxwedana qonaxa duyemîn a Berxwedana Serdermê li pey xwe hêlan.

Di guhartinên ku di Sûriyê de hatine çêkirin de gelê Efrînê ji van kiryaran ne dur bû. Bi hatina HTŞ'ê û komên çeteyan re, çawa ku berê xwe dan bajarê Helebê yekemîn dever him ji Efrînê ve, him ji Ezaz û Babê û him jî ji Helebê ve komên çeteyan weke gurên çavbirçî berê xwe dan Şehbayê. Bi vê yekê armanc û xeyalên wan ew bû ku wê hemû gelê Kurd di Şehabaya dorpêçkirî de qir bikin û komkujiyan pêk bînin. Lê belê ev yek li gorî wan nebû, di encama lihevkirinên herêmî û hêzên kowalisyonê de di di roj û şevekê de Rêveberiya Xweser biryara derbaskirina gelê Efrîn û Şehbayê ji Şehbayê da û di bin lihevkirin û parastina hêzên navnetewî, Şehba hat valakirin. Ev gel piştî 7 salan ji afrandina jiyaneke nû di bin saya koçberiyê û hêviya vegera Efrînê, qedera wê ew bû ku êşa koçberiyê careke din, hê tujtir û girantir jiyan bike…

Di 3'ê Kanûna Pêşîn ji sala 2024'an de gelê Efrînê gihîşt herêmên Rêveberiya Xweser; Rojhilatê Firatê. Ji Tepqa, Reqa, Kobanê û ber bi herêma Cizîrê ve gel belav dibe. Hejmara herî zêde li Tepqa û Reqayê dimînin û ji bo wan kampên fermî li Tepqa yê hatine vekirin û bi hezaran gelên ku bê mal û cih mane li wan kampan jiyan dikin. Li ser bicihbûna gel di wan kampan de, nêzî 11 heyvî derbas bûye. Têkildarê rewşa gel di wan kempan de, her wiha bi hatina zivistanê re amadekarî û alîkariyên saziyên mirovî Hevserokê Kampên Efrîniyan li Kantona Tepqayê Mistefa Reşîd ji Rojnameya me re axivî.

**Ji ber pêdivî û lezbûnê, gel li Tepqayê ma**

Mistefa di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser destpêka derbasbûna gel û wiha bilêv kir: "Dema em derbasî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn, li gor îmkan û derfetan diviyabû bi awayekî bilez cih ji gel re were amadekirin. Ji ber derketina ji Şehbayê û derbasbûna bi hezaran ji malbatan gelek bilez û ne di texmînan de bû, ji lewra di avakirina cih de bivê nevê zehmetî hatin kişandin. Li gor pêwîstiyan ji ber ku Reqa û Tepqa herêmên herî nêz bûn ku gel xwe gihandinê, li ser wê esasê kamp hatin vekirin. Bi piranî gel li Tepqayê hate pêşwazîkirin û cihên mayînê bi awayekî bilez di stadyoma Tepqayê de hatin vekirin. Her wiha li nav bajêr de di gelek cihan de weke mizgeft, navend û di nava malbtan de gel bi cih bû. Niha piştî derbas bûna nêzî 11 heyvan, hinek rewş hate guhertin û gelên ku di Tepqayê de man, ji wan re li gorî sazîbûyîn û sîstema kampan, cadir û cihên pêwîst ji her malbatekê re hatin amadekirin".

**Kampa Aştî û kampa Azadî**

Reşîd di berdewamiya axaftina xwe de kampên ku gel tê de jiyan dike, xuyakir û wiha got: "Niha li Tepqayê 2 kampên koçberîn me yên Efrînê hene; Yek li stadyumê ye Navê wê Aştî ye û yek jî navê wê Azadî ye, her wiha niha amadekariya yeke din tê kirin, da ku gelê me yên di dibistanan de cih girtine derbasî wir bibin. Ji ber ku bi hatina gel re dibistanên Tepqayê ji bo gel hatin vala xistin û ev bû saleke xwendekar nikarin di wan dibistanan de bixwînin. Di her du kampan de navendên tenduristiyê yên Heyva Sor a Kurdî lê hatine vekirin. Di çarçoveya rêveçûna jiyana gel de, hin malbatan ji xwe hinek dukan vekirine ku bi wê debara jiyana xwe dikin. Her wiha di kampê de me çeredariya xwe bi xwe avakiriye û pêwîstiyên heyî bi hev re çareser û derbas dikin".

**'Nûkirin û amadekariya binesaziya çadiran tê kirin'**

Reşîd da zanîn ku beriya zivistanê nûkirin û amadekariya binesaziya çadiran tê kirin û wiha domand: "Bi hatine gel re weke ku me aniye ziman li gor pêwistiyê gel xwe di wan çadiran de îdare kirin, helbet di zivistanê de gelek zehmetî derdiketin pêşiya gel ji ber ku binesaziya wê li gor zivistanê nehatibû amadekirin. Niha bi hatina zivistanê re bi serpereştiya Kampaniya Şemal, çadirên gel tên nûkirin, her wiha wê binesaziya her çadirekê ku maleke, bê çêkirin. Ev yek jî da ku di zivistanê de rastî lehiyên baran û sermayê neyên".

**'Bila rêxistinên cîhanî bi erkên xwe rabin'**



Reşîd di dawiya axaftina xwe de ev anî ziman: "Li gor derfetan Rêveberiya Xweser alîkariya pêwîst pêşkêş dike, li şûna alîkariya xwerinê her meh, hejmarekî pereyan belav dike. Her çiqas em bibin alîkar jî, wê helbet zemetî û astengî hebin. Hinek zehmetiyên me di aliyê peydakirina dermanên nexweşiyên demdirêj re derdikevin, pir zû nayên peydakirin. Lê belê ji aliyê rêxistinên mirovî yên navnetewî û cîhanî alîkarî nayê kirin û li gor rewşa gel ne têrker e. Banga me ji raya giştî û rêxistinên navneteweyî yên cîhanê re heye ku li hember vê gelî û tevahî koçberan bi erkên xwe yên mirovî rabin. Ji ber ger ev rêxistin li herêmên Rêveberiya Xweser xwe bicih kirine, wê demê erka wan e ku xebatên xwe li gorî pêwîstiya gel birêve bibin".

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER HEVALBENDÎ Û ALÎGIRIYÊ**

**Çû ser tayê wî:**
- Bû hevalbendê wî; bû alîgirê wî.

**Milên xwe dan hev:**
- Bûn hevalbendên hev; alîkariya hev kirin.

**Ket ser riya wî:**
- Bû hevalbendê wî; bû alîgirê wî.

**Pê li devera hev nakin:**
- Bi ser hev re tên; hev diparêzin; li dijî hev tiştekî nakin.

**Pişta wî girt:**
- Bû hevalbendê wî; alîkarî dayê; piştgiriya wî kir.

**LI SER FIKARAN**

**Destê min li ser dilê min e:**
- Ez bifikar im; gumanên min hene; ez bitirs im; ez ditirsim tiştek bibe.

**Piştkul e:**
- Ditirse ku tişteke nebaş biqewime; fikarên wî hene.

**Pişta wî jê kul e:**
- Bi heman wateyê.

**Xencera min li mal e xeyala min li bal e:**
- Ez pir xema wê dixwim; ditirsim tiştek pê were; ez pir bîriyê dikim.

**Xwe jê diçine:**
- Xwe jê dûr digire; xwe nêzîk nake; naxwaze bibîne; xwe jê diparêze.

**LI SER ÊŞ Û ZEHMETIYÊ**

**Agir xweş e lê xwelî jî jê çêdibe:**
- Tiştên xweş zehmetiya wan jî heye.

**Bar naçe ber kerê, ker diçe ber bar:**
- Kar zehmet dike; karê hêsan dike pirsgirêk.

**Barê wî giran e/bargiran e:**
- Karê wî zehmet e; malbat qelebalix e.
(Kesên karê wan pir be, yan berpirsiyariya wan mezin be ji bo wan tê gotin)

**Ber xwe fireh kiriye:**
- Gelek kar dane pêşiya xwe.

**Bûye dasûyê masî:**
- Ne derdikeve, ne diçe xwarê; pirsgirêkeke biêş e.

**Çala bi derziyê ye:**
- Pir zehmet e.

**Çawa ku maran pê ve dabe:**
- Pir êşiya; qîrên pir bişewat dan.

**Daye ser ve:**
- Barê wî pir giran bûye; nikare ji bin barê xwe derkeve; karê wî pir e.

Dema Eyşo dibêje Fato ya şewitandinê ye, dema Fato dibêje Eyşo ya

**şewitandinê ye:**
- Em nizanin kî heq e kî neheq e; her du jî xwe heq dibînin, em nikarin ji navê.
derkevin.

**Dinya di ser serê me de xirab bû:**
- Me pir êş kişand; gelek tişt hatin serê me.

**Gelek şevên reş dîtine:**
- Gelek tişt hatine serê wî.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Piştî gava 26'ê Cotmehê divê Tirkiyê çarçoveyekî siyasî û zagonî ava bike'



Parlamentera DEM Partî ya Şirnaxê Newroz Uysal da zanîn ku gava 26'ê Cotmehê wê pêşî li nîqaş û gumanên dewletê li ser çareseriyê û nêzîkatiya Tevgerê bigre û got, "Komisyon divê dem û meseleyê dirêj neke, bikaribe çarçoveyekî siyasî û zagonî ava bike û gavên rast biavêje."**R-3**

## Entegrasyona Demokratîk yekîtiya gel e




Rêber Apo di Manîfestoya bi ser navê Aştî û Civaka Demokratîk ku ji kongra 12'mîn ya PKK'ê re şandibû bal dikşîne ser entegrasyona demokratîk û wiha dibêje: "Entegrasyona demokratîk tê wateya civateke demokratîk bi dewlet netewî re."**R-4**

## Nexweşxana Gel a Qamişlo; ji cihê îşkenceyê veguherî cihê xizmeta mirovahiyê



Rêveberê Giştî Yê Nexweşxana Gel a Qamişlo Bijîşk Ciwan Hemê da zanîn ku ew ê hemû hewildanên xwe bixin xizmeta gel û got; "Tenduristî ne roj û şeveke, em ê jî gavên xwe li gorî derfet û buhabûna qurbaniyên ku vî gelî dane, bavêjin."**R-6**

## Ji çiraxên hunera Kurdî



Hunermendê şoreşger Dijwar Reşîd dengê axîna welat û qêrîna azadiyê bû, êşa xwe veguhertibû hunerek xizmetkar, ji bo welat, şoreş, şoreşgeran, ziman, azadî, berxwedan û rûmetê stran gotin.**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1325 16-Mijdar-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# 'RÊVEBERIYA XWESER NÛNERA PÊKHATEYÊN HERÊMÊ YE'

Serokê Qebîleya Tay Şêx Hesen Ferhan Ebdullrehman da zanîn ku hin alî di hundirê Sûriyê de hene nûnertiya gelên Sûriyê nakin û bi piştgiriya hêzên derve hewil didin tevliheviyê di navbera pêkhateyên herêmê de derxin û aramiyê têk bibin. Herwiha Hesen tekez kir ku tenê projeya Rêveberiya Xweser dikare bibe cihê çareseriyê û misogerkirina mafê tevahî pêkhateyan.**R-5**



## Sûdan; Tundiya zayendî li dijî jinan weke amûreke qirkirina etnîkî bikar tînin



Bajarê Faşêr a herêma Darforê ya Sûdanê piştî ku ket destê Hêzên Piştgiriya Lezgîn rastî karîseyekî mirovî tê. Darvekirinên meydanî, tecawizên komî li dijî jin û zarokan di heman demê de binpêkirinên mafên mirovan ên giran hatin kirin.**R-2**



**Ma heta kengî şerxwazî?**
Ahmet Aktaş R-4



**Şer`i wê karibe berdêlên serdana ji Koşka Spî re bide?**
Îdrîs Henan R-5



**Sînemaya Azad**
Remezan Olçen R-7

# Sûdan; Tundiya zayendî li dijî jinan weke amûreke qirkirina etnîkî bikar tînin

Bajarê Faşêr a herêma Darforê ya Sûdanê piştî ku ket destê Hêzên Piştgiriya Lezgîn rastî karîseyekî mirovî tê. Darvekirinên meydanî, tecawizên komî li dijî jin û zarokan di heman demê de binpêkirinên mafên mirovan ên giran hatin kirin.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Ji Nîsana 2023'an vir ve li Sûdanê şerên dijwar di navbera artêşê û Hêzên Piştgriya Lezgîn de ku ji aliyên derve ve têne piştgirîkirin; rû didin. Piştî şerên dijwar Hêzên Piştgiriya Lezgîn piraniya El-Faşêr ku bajarê herî mezin ê herêma Darforê li rojavayê welêt, kontrol kirin.

Di 27'ê Cotmehê de Hêzên Piştgiriya Lezgîn bajarê El Faşêr, paytexta eyaleta Bakurê Darforê kontrol kir. Bi zêdebûna raporên li ser binpêkirinên tirsnak ên li dijî sivîlan, di nav de îdamên meydanî, tecawizên komî û revandina jinan bû sedema fikarên navneteweyî yên berfireh. Roja Înê ,31'ê Cotmehê Neteweyên Yekbûyî û Komîteya Navneteweyî ya Xaça Sor (ICRC) fikarên xwe li ser raporên binpêkirinên mafên mirovan ên cidî, di nav de îdamên meydanî, tecawizên komî û revandin piştî



kontrolkirina El-Faşêr ji hêla Hêzên Piştgriya Lezgîn; anîn ziman.

**Tawanên hovane yên li dijî jinan**

Berdevkê Komîserê Bilind ê Mafên Mirovan ê Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku piştî ku Hêzên Piştgiriya Lezgîn ketin kampên koçberan li nêzî zanîngeha Ei-Faşêrê, herî kêm 25 jin di bin gefa çekan rastî tecawiza komî hatin.

Komîteya Parastina Rojnamevanan di raporeke amadekiribû ragihand ku herî kêm sê rojnamevanên jin ji aliyê çekdarên Hêzên Piştgriya Lezgîn ve rastî tecawizê hatine di heman demê de 13 rojnamevan jin û mêr li bajarê Faşêr li Bakurê Darforê winda bûne.

Di raporê de hate destnîşan kirin ku ji dema Hêzên Piştgiriya Lezgîn bajar kontrol kirine, El-Faşir bûye cihê binpêkirinên li dijî sivîl û rojnamevanan. Komîteyê piştrast kir ku bi binpêkirinan girêdayî jî êrişên fîzkî, revandin, destserkirina nivîsgehên çapemeniyê û veguherandina wan weke navendên binçavkirinê û pêkanîna tundiya cinsî li dijî rojnamevanên jin; hatin kirin.

Sekreteriya Giştî ya Meclisa Neteweyî ya parastina Zarokan binpêkirinên ji aliyê Hêzên Piştgiriya Lezgîn ve li bajarê El- Faşêr pêk hat ku di encama wê de 2000 zarok hatin kuştin di heman demê de 3000 zarokên din winda bûne li gel 3000 jin û 1500 kesên bi temen mezin; şermezar kir.

**Komkujiyên hovane**

Wezîra Dewletê ya Xizmetguzariya Civakî ya Sûdanê Selma Ishaq diyar kiribû ku bajarê El- Faşêr rewşeke mirovî xirab dijî piştî kontrolkirina wê ji hêla Hêzên Piştgriya Lezgîn.

Li gorî malpera "Endepentend Erebiyê" Selma Ishaq destnîşan kiribû ku binpêkirinên li dijî jin û zarokan hatine kirin wekî qirkirina etnîkî ya sîstematîk têne hesibandin, ku di rojên pêşîn de hêzên êrişkar komkujiyên hovane pêk anî, di encamê de zêdetirî 300 jin hatin kuştin û 25 rewşên tecawizyê hatin belgekirin, ji bilî rewşên din ku hîn têne şopandin. Binpêkirin ne tenê li dijî jinê sînordar maye lê 750 zarok ji malbatên xwe hatin qutkirin, hin ji wan zarokan rastî, revandin, kuştin û tundiya cinsî hatin.

tWezîra Dewleê ya Wezareta Xizmetguzariya Civakî daxwaza mudaxeleya bilez ji civaka navneteweyî kir da ku sivîlan biparêze û rêyek ewle ji bo jin û zarokan peyda bike û tekez kir ku tiştê ku diqewime "sûcek mezin li dijî mirovahiyê ye" ku ji bo rawestandina binpêkirinan û hesabpirsîna sûcdaran tedbîrên tavilê hewce dike.

# Kuştina di bin navê namûsê

**Berîtan Xalid**

Di dema civaka xwezayî de, civak dûrî zihniyeta zayendperestî jiyan avakiri bû. Ji vê civakê re civaka exlaqî, polîtîk û komînal tê gotin. Zayendperstî û nijadperestî neketibû jiyanê. Ji bo hêz û nirxên ku jin diafirand, di civakê de nasnameya jin xwedawendîtî bû. Di her Qebîleyê de nirxên taybet dihatin parastin. Dema ku ol û bawerî neketibû destê hakimîyeta bavksalarî ev nirx pîroz dihatin dîtin. Piştî pergala baviksalarî, pîrozî li gor cewhere xwe nema hat jiyan kirin. Yên ku berdewamîya bawerî yê xwe dikir jî, ew kes dihat sucbarkirin û lanetkirin. Mînak; jinên ku di karê bijişkî de xwedî afrînerîya mezin bûn, dihatin şewtandin. Ev mînak ji hezar mînakê yek mînake ku em dikarin wek inherafa olî bigrin dest. Di encama inhirafên ku li ser bîr û bawerîya civakê dan meşandin, bû sedem ku di roja me ya îro de jin bên kuştin. Di guhartina wataya pêyva namûs û şerefê de, di her civakekî de cureyên inhirafên pir mezin dan avakirin. Li gor baweriyên çanda civaka xwe, peyva Namus û Şeref hat tarîf kirin. Namûs kirin amûrek ku jin bi rêbazên cuda bê tunekirin. Namûs ji wataya xwê ya heqîqî û rast hat durxistin. Namus ji bo parastina kesayeta jin hate pênase kirin. Piranî di welatên cihanê de kêm zêde jin û namûs hemwate ye. Dewletên ku bi hişmendîya şerîatê tev di gerin, namusê di şexse jin de wek perensîbên olî watedar dikin û di qanunên cezakirina jinê de vê esas digrin dest. Bi giştî li Rojhilata navîn Namus bi jinê ve tê girêdan. Bi hinceta parastina şeref û namusa malbatî, jin di bin navê têkelîyên veşartî, xiyanet û bê exlaqîyên ku bê bingehin, ji alîyê feraseta pîvanê civaka kevneşop tê sucbarkirin, piştra bi destê bav, bira an zilamek ji Malbatê tê Kuştin. Şîroveya namusê bi zihniyeta baviksalarî, gihiştîye asta ku bi serbilindî jin bêne kuştin û qetilkirin. Ev jî tê wateya ku serbilindi û serbijêrtîya mêr bi jinê tê penasekirin. Em dikarin bêjin çavkanîya şîroveya namusê bi kesayt û sekna jinê ve hatiye tarîfkirin.

Şêwaz, rê û rêbazê perwerdekirina malbatê ya zarokên xwe di vê bûyerê de jî xwedî role. Rê û rêbazê perwerdekirina malbatan a zarokên xwe dibin bandora zîhniyeta zilam a serwer de ye. Lawik xwedî nirxe, malbat hemû derfetên xwe dixe bin xizmeta mezinkirina lawikê xwe, lê belê wisa nêzî keçên xwe nabin. Di her tiştî de cûdahî dixin navbera lawik û keçên xwe. Ji bo keçik bikarbe bijî, divê baş xizmeta zilam bike. Weke dîtir tu mafê jiyanê nadin jin. Tişta ku destûr nade jin azad bijî û çarenûsa wê dikeve destê zilam kevneşopiyên civakê ne. Kevneşopiyên wan gelekî cûdahî dixin navbera jin û zilam de. Zilam serwer e û her tişt di destê wî de ye. Jin ji bo bijî neçare li gorî xwestekên zilam tevbigere. Jiyana ku jin avadike ew jî bi rengê zilam e. Di nava wan kevneşopiyan de rengê jin wenda ye. Heta rengê jin heye kesek napirs e. Ji ber ev têgeh ji ticarî nebihîstine. Keç hîna neketiya pênc saliya xwe de despêke ji wê re dibêjin tu jinî û divê tu namûsa xwe biparêze. Jin heyanî dimre hertim dibin wê derûniyê de dijî.

Yek ji sedema ku pirsgirêk di civakê de kûrbibin û jin werin kuştin temaşekirina rêzefilmên Tirkan û internet bû. Herkesî ew rêzefilim temaşedikirin û diketin bin bandora wan de.

Li ser wan esasê, di civakê de jin û namûs kirin mijara herî hessas. Ji bo vê yekê jî carna zilam jinê nakuje, xwe dikuje. Ji ber ku jin namus û şerefa zilam tê hesibandin. Ji tevahîya jiyana wê xwe berpirsiyar dibene. Yanî her tiştê jinê ya xwe dizane û xwe malîkê (xwedîyê) wê dibîne. Heger li gor pîvanên zayinperestîyê tev negere û pêk neyîne, nikare di nava wê civakê de jiyana xwe berdiwam bike. Ji ber ku di nava civakê de "Bê Namus" û "Bê Şeref" bê dîtin. Ev encamên ku tên jiyan kirin, bingeha xwe ji pergala zilamtî ya hegomonik digrin. Di feraseta pergala hegomonik de, wekî hukumkirina ji derve ku tê penasekirin li ser jinê ye, lê hukum kirina hundirin jî li ser mêr tê pênasekirin. Ev pergal ji jin û mêr re rol avadike.

Li ser vê esasê ji bo bi cih kirina pergalên serdest ,her xerabîyê di nav civakê de bi cih dikin. Di sed sala 21, ê de bi navê namus û şerefê tundî ya herî mezin li ser jinê tê kirin, bi taybet di mijara namusê de rêbazên herî wahşîyane tên bikar anîn. Jin ji hemî mafên xwe hatiye mehrumkirin. Dema ku zilam bi navê şeref û namûsê jinkujî yê dike, li gor zihniyeta desthilatdarî bi armanca parastina civakê, ji bê exlaqîyê dikûje. Ev jî dihele ku di nav civakê de kuştina jinê normal bê ditin. Piranî kûştinên ku bi navê namusê tên kirin, di encama eşq û evînên ne rast tên pêk anin. Hêstên bê bawerî yê di nav bera jin û mêr de tê kurkirin. Di nav civakê de zayendperestîyek xurt didin meşandin. Nasnameya her du cînsa bê regezên wekhevî û azadîyê tê avakirin. Nasnameya mêr li ser bingeha desthelatdarîyê û nasnameya jin jî li ser bingeha koletîyê tê avakirin. Rêgezên Hevjiyana Azad di pêwendî û têkelîyên jin û mêr de naye esas girtin û nayê jiyankirin. Ji bo wê jî zayendperestîya ku hatîye avakirin, dibe sedem ku di malbatê de keç bi zorê bê zewicandin, bê tecawizkirin, were Revandin, were hepiskirin û di davîde bê kûştin. Her wek ku Rêber Apo jî dibêje: "Dîroka kolekirina jinê nehatîye nivîsandin û dîroka azadî ya jinê li benda nivîsandinê ye." Ji bo wê jî her li ser vê axê carekî din dîroka jin nujen bibe. Helbet ev ji ne bi zihniyeta serdet ya bavksalarî bi fikira jina azad wê carekîdin bê afrandin. Piranî welatên ku hatin nav lêkirin, jin bi çalakî û serhildanên cuda nerazîbuna xwe didin nîşandan.

Tişta ku bu sebeba nivîsandina wê meqalê, têkoşînên herî mezin ku jin di roja me ya îro de jiyan dike, di heman demê de tundîya herî giran jî jiyan dike. Jin bi hişyar bûna xwe ji xewekî giran, sînorên ku hatibun diyarkirin rakirin.



# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yûsiv**

Hunermendê şoreşger Dijwar Reşîd Dengê axîna welat û qêrîna azadiyê Hunermendên şoreşger ên kurd rolek serekeyî lîstine di parastina nirxên netewe ya kurdî, û di parastina mîrateya çandî, nasnameya neteweyî û zimanê kurdî de ji hewldanên çewisandin û tunekirinê, hunermendên şoreşger , huner wekî amûrekî bikaranîne da ku nasnameya neteweyî û çandî ya kurdî nîşan bidin - bi riya stranên neteweyî û şoreşgerî, helbestên lêgurkirinê , awazên germkirinê û bikaranîna zimanê kurdî di stranên wan de — û pêş seknandin li dijî siyasetên qedexekirin û astengkirinê ku gelek caran li ser ziman hatibû ferzkirin,

Wan bi karên xwe yên edebî û çandî û stranên xwe yên şoreşgerî , êşên gelê Kurd û hêviyên wan ên azadî û serxwebûnê ve dest nîşan kirin , di encamê de hişmendiya neteweyî û ruhê xweparêziyê di nav nifşên nû de bi hêz avakirin û wan rolek girîng lîstin di parastina kultûr û folklor de û folklor ji tiştê devkî yê metirsîdar li ber tune bûnê veguhêrandin hêmanek hunerî ya zindî di konseran,êzgehan, festîval û pîrozkirinan de.

Hunera wan amûrekî berxwedanê bû dijî zordariya siyasî; gelek stranan ,peyamên neteweyî û şoreşgerî yên ku hestên girsên gel germ dikirin digerandin , ew bûn ku ji bo evînê stran gotin di demek şer de û ji bo azadiyê di demek zordariyê, da ku bibêjin ji cîhanê re: "Em li vir in , miletek in tucar namirin ."

Hunermendê şoreşger Dijwar yek ji wan hunermendên şoreşgêr e ku rolek girîng lehîstibû di bilindkirina moralên gelê xwe de, bi taybetî di dema têkoşîna siyasî û çekdarî de û di parastina nasnameya neteweyî û çandî ya Kurdî de bi riya xebatên xwe yên hunerî û stranên xwe û dengê xwe yê nazik , wî jiyana xwe kir fedayê hunera xwe û şehîd ket, di destek yê wî de tembûr û di destê din tifeng .

Hunermend Dijwar (Mustefa Reşîd) di sala 1960'an de li gundê Rihanîkê, yê gundewarê Dêrikê ya Rojavayê Kurdistanê, ji dê û bavek kurd (Hacî Ebdullah û Minawer) hat dinyayê.

Ew mezin bû di nav malbateke kurdperwer, welatparêz û xebatkar de, ku bi piştevaniya xwe ya kûr ji bo welat û şergeran û girêdana xwe ya xurt bi nirxên neteweyî, çandî û dîrokî ya kurdî ve tê nasîn , ku ji 12 zarokan (5 kur û 7 kec) pêktê, ku ji çandiniyê û xwedîkirina sewalan riyek girt di debara jiyana xwe de û ji evîna welat û şoreşgeran rêbazek danî bo jiyan û helwest girtinê, ew malbat sembolek bû di fedakarî û dilsoziya xwe de ji bo welat , her tiştên hêja û giranbuha daye ji bo azadî û serxwebûna kurdistanê .

Meylên Dijwar yên hunerî û hezkirina wî ji bo stranbêjiyî û mûzîka kurdî di temenek piçûk de destpêkir dema ku ew duzdeh salîbû, di bin bandora stranên neteweyî û folklorî yên şehsiwarên mûzîka kurdî yên mîna:(Mihemed Arif Cezrawî, Mihemed Şêxo, şehîd Sefqan, Çiya û Xemgîn Bîrhat), ew bûn çavkaniyên îlhama wî û di kûrahiya dilê wî de têkiliyeke hisdar "wejdanî"ya kûr di gel hunera kurdî ya resen çandin

Ji wir rêwîtiya wî bi awazê re hate destpêkirin, ne wekî kevneşopiyek derbasdar, lê wek zayîna dengekî ku li xewnê digire , nasnameyê tekez dike, û bi dilpakî ruhê girêdayîbûnê diyar dike.

Kariyera wî ya hunerî dest bi geşbûn kir û stêrka wî li esîmanê huner û stranbêjiya kurdî çirisî di salên 1980'an ji sedsala borî bi rêya tevlêbûna wî ya domdar di bûyerên neteweyî û pîrozbahiyên niştimanî de lehîstî.

Ew gelek caran wekî mêvanê rûmetê di dawatan û helkeftên herêmî de, di hate vexundin û ji ber xwestekên gel û hezkirina wan ji dengê wî re ku bêhna stranên neteweyî jê dikirin di pêşiyê de strana wî ya navdar "Hebsa Diyarbekir", ji wan re digot ,ku bûye sembola deng û nasnameya wî ya hunerî.

Ji ber rewşên dijwar ên jiyanê û zextên ku hêzên desthilatdar a Sûriyê li ser hemwelatiyên Kurd pêk dianîn, hunermend Dijwar neçar ma ku di sala 1983'an de welatê xwe bihêle, û berê xwe bidê Lîbyayê bi mebesta kar û alîkariya malbata xwe bike.

Di koçberiyê de, xerîbiya wî ne bû asteng li pêşiya xebata wî ya neteweyî , lê herwiha bû destpêka gaveke nû ji bo çalakiya wî, li wir wî kadroyên Partiya Karkerên Kurdistanê nas kirin, û tevlî nav refên tevgerê bû , û beşdarî çalakiyên partîzanî û neteweyî bû di nav girsên gel de, herwiha rolek girîng lehîst di rêxistinkirina çalakiyên çandî û hunerî û vejînkirina pîrozbahiyên neteweyî de, yek ji girîntirîn deskeftiyên wî , damezrandina komek hunerî ya neteweyî yê kurdî li Lîbyayê, bi navê "Doza Karker" bû , ev kom bû minberêk hunerî ku bi navê dozê diaxavî û derbirîna rûhê têkoşîn û nasnameya kurdî dikir li ser xaka xerbetê.

Piştî ku ji Lîbyayê vegeriya Rojava, ew çû Lubnanê, ew tevlî akadimîya şehîd Mehsûm Qurqemaz bû, li wir ew beşdarî kursa ramyarî û leşkerî ya giran bû, ku taybetî hatibû amadekirin bo perwerdehiya kadroyên şoreşger û amadekirina wan ji bo hilgirtina alaya berxwedanê û têkoşînê li dijî zordarî û piştguhkirinê.


Piştî ku dewreya perwerdê bidawî kir Rêber Apo lê pêşniyar kir ku ew here Ewropa û tevlî koma Berxwedan bibe, ku beşdarî vejîna çalakiyên hunerî û çandî di nav revendên kurdî yên li bajarên Ewropayê belav bûyîn bibe ,,lê dilê wî rêyek din hilbijart — rêya eniyên germ— û wî hilbijart ku dengê wî bila di nav qada şer de bilind bibe, ne li ser dikeya şanoyê , ji ber vê yekê ew di sala 1986'an de vegeriya Rojava, di dilê wî de girêdanek bê veger û biryarek bêhempa û kûr bi dadweriya doza Kurdî ve , li wir, li herêma Dêrikê , ew bi hemû enerjiya xwe, tevlî xebatên partîzanî û qadan bû, ew bû rêxistinvanek di çalakiyên neteweyî de û him çalakvanek di nav rêzên girseya gel de û him jî bi hevalên xwe re beşdarî karê rêveberiya xalên sînorî yên ku sê beşên Kurdistanê bi hev girê didin bû ( Bakur, Başûr û Rojava ), û ji wir jî, ew beşdarî veguhastina şervanên bo eniyên şer yên germ di eyaletên Botan û Behdînan de û di heman demê, wî pêşbaziya hêzekên nû yên têkoşer dikir, da ku werin şandin bo qampa Şehîd Mehsûm Qurqemaz, li wir, ew derbasî perwerdehiya ramyarî û leşkerî dibûn, bo amadekirina wan bo rêya têkoşîn û berpirsiyarîyê di xendekên azadî yê de.

Piştî wê, ew bi komek hevalên xwe re çû qada şerê germ di eyaleta Botanê ,di dilê erdnigariya berxwedanê de . Lê mala felekê xirabe , çavê wê birije, gelek caran barê şoreşgeran giran dikir , rehmet li wan ne dikir , di encama xeberdana xinizekî (xayînekî) gropa wan kete kemîna ku artêşê dagirkeriya Tirkiyê ji wan re vedabû li gundê "Qesrika Gelî" di 7ê Mijdara 1987'an de, li qontara çiyayê Cûdî, wan li hemberê mirinê bi qehremanî li berxwedan ku qet nayê ji bîr kirin û bi xwîna xwe nivîsandin rûpelên herî bedew yên qehremanî û fedakariyê , piştî wê berxwedana lehengî Dijwar û hevalên xwe tevlî kerwanê şehîdan bûn, alaya azadî bilind hildan di asmanê Kurdistanê .

Wî li pişt xwe mîrateyek hunerî ya bi bandor hişt di du albumên stranbêjiyê de ,yekem bi xwişka xwe ya şehîd Warşîn re, ya duyem bi koma "Doza Karker" re, di van albûman de, wî hevrêzîyek di navbera huner û têkoşînê , û di navbera deng û dozê de çêkir, ji stranên wî yên navdar:

1. Rojê min e, cejna min e
(Gotin û awaz Şehîd Dijwar)
2. Bûm çiraxê ronî
(Gotin Şehîd Rizgar, Awaz Nîzar Yûsif).
3. Strana "28 Adarê – Şer bûye xweş, şerê gel"
(Gotin Şehîd Rizgar, Awaz Şehîd Dijwar)
4. Newroz vaye tê gelê min şabe
(Gotin û Awaz Şehîd Dijwar)
5. Diyarbekir, ey Diyarbekir
(Gotin û Awaz:Şehîd Dijwar)
6. Va dibin derya
(Gotin Şehîd Rizgar, Awaz Şehîd Dijwar)
7. Vane gerîla, Vane gerîla
(Gotin Şehîd Rizgar, Awaz Şehîd Dijwar)

Şehîd Dijwar ne tenê hunermend û şervanek bû ku tifingek û tembûr hilgirtibû , lê dengê wî çekek bû, û rîşa wî aleyek bû ezman ji ber radihejiya , di çavên wî de, ronahiyek hebû mîna derbûna rojê li welatek azad , di dilê wî de şoreşek hebû ne bi çekan melûl dibû , ne bi ba ew sar dibû, awirên wî qet tirs û perwa nas ne dikirin , lê tirs bi xwe digerandin wekî peyamekî ,her guleyeka ku di teqande digot: "Em nayên şikestin". û her awazek ji tembûra wî distirî :



"Azadî tê."

Hunera wî zêdetir bû ji awazan, ew vedenga birînên welat û nalîna gelê wî bû ,wî dev ji ronahîdan û şanogehê berda, navûdengî terikand ya ku her tim li pey diket, wî rahiştina çek û tembûr hilbijart, xweste ku strana xwe veguhêrîne çekek bo berxwedanê .

Şehîd Dijwar şewat û êşa xwe guhêrtibû hunerek xizmetkar, di di stranbêjiya ji bo welat , şoreş û şoreşgeran ,stranên xwe digotin li ser bêrîkirina welat, êşên dûrketinê, berevaniya welat û mirov, girêdana bi xak û ziman ve û şer kirin ji bo azadî û rûmetê.

Dijwar ne hunermendekî kevneşop bû, lê ew dengê dozekî, rûhê gelekî, û nebeza şoreşekî bû ,wî tembûr hildigirt wekî ku kesekê çekê digire, û wî stran digot ji bo azadiyê wekî ku tekoşerên di xendekan de şer dikin. Bi çûyina wî û şehîdbûna wî, gelê kurd stûneke hunerî û şoreşgerî ya bêhempa winda kir, û li dû xwe valahîyek di nav warê stranbêjiya kurdî de hişt ku nayê dagirtin, Dijwar naskiriye ne tenê wekî hunermendekî, lê wekî tekoşerekî ku di her maqamekê de xem û hêvîya gelê xwe digerand, û bi xwîn û awazên xwe rûpelên bedew ên rûmet û qehremanî nivîsand.

Piştî salan ji berxwedan û hunerê, Dijwar şehîd ket , lê paş xwe mirasek hunerî a dewlemend ji stranên şoreşgerî û neteweyî hişt; dengê wî ma zindî di guhên gel de, û stranên wî bûn sirûdên hêvîyê ji bo her kesê ku ji bo azadî têkoşîn dike, wî di deng û rûhê xwe de giyanê Kurdistanê yê qet namirê pêkdianî , ewê dê bimîne di bîra nifşên bên de, û hîn jî dengê wî di guhên mirovan de vedide.

Lê mixabin , piraniya stranên wî tenê di tomarên vîdyoyên belgekirina pîrozbahiyên neteweyî û konseran de mane , bê ku werin komkirin di albûmên taybet de?, tenê du albûmên wî hatin weşandin, yek bi xwişka wî ya şehîd Warşîn re, û ya din bi koma "Doza Karker". Ku beşeke mezin ji mîrasa wî ya stranbêjiyê belav maye , û di bîra wan pîrozbahiyan de parastî mane, ne di pirtûkxaneyek rêxistinkirî de ku denga wî ji bo nifşan biparêze. Serbilindî û mandarî ji bo giyanê te yê pak û awaza teya berxwedêr, û dilê te ku tiştekî nasnakê ji bilî nebeza azadî yê.



## Sînemaya Azad

**Remezan Olçen**

13'ê Mijdarê salvegera 65'an a Komkujiya Sînemaya Amûdê bû. Ew birîn wê tu carî nekeve û ew zarokên delal qê tu carî neyên jibîrkirin. Li Amûdê rejîma Baas bi sînemayê zarokên Kurd sotin, qetil kirin. Sînemayê kirin çek û bi ser zarokan agir barandin. Vê hunera ku deriyên dilî vedike weke çekeke xedar bi kar anîn, qirêj kirin.

Lê îro roj sînema li heman warî li rastiya xwe vedigere. Kamera, deng û dîmen, heqîqetê nîîan dide. Li Qamişloka evînê Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Rojava ya 5´an heye. 'Çîrokên hevpar sînemaya azad e' şîara vê mîhrîcanê ye. Ji beên welat û derveyî welat bi dehan fîlm beşdar bûne. Herçş kesê ku derfeta xwe hebe bila biçe û li wê perdeya bi efsûn a sînemayê li wan çîrokên hevpar bila temaşe bike.

Di nivîsên min ên berî vê de jî heye; mîhrîcan ji bol i hev kombûnê, ji bo hevnasînê, ji bo danîna têkiliyê çalakiyên hêja ne. Di vê cîhana bêrehm de bêhna mirovî bi çalakiyên bi vî rengê fireh dibe. Dike ku mirov bi çavekî din li gera gerdûnê temaşe bike. Îcar ev mîrîcan hem nîşan dide hem jî çîrokan dibêje. Çîrokên me, aydî mey anî me ji me re dibêje. Çavê derhêner van çîrokan çawa dîtiye, lîstikvan çîrokê çawa jiyane û gotine, muhîm e. Ji bo dîtina xwe sînema heqeten alaveke hêja ye.

Di vî demî de vegêrana çîrokê di krîzekê de ye. Ev mijara nivîsa min a heftiya bihurî bû. Niha vê heftiyê bi sînemayê em hem dikarin krîza vegêrana çîrokê tecrûbe bikin hem jî bikaribin bibînin ku em hîn jî dikarin çîrokên xwe bibêjin. Em Kurd ne tenê ji qada siyaset û hiqûqê lê ji qada hunerê jî hatibûn avêtin. Ziman hatibê jêkirin, guh hatibû kerkirin û çav hatibê korkirin. Îro roj bi saya têkoşînê Kurd hem li siyaset û hiqûqê hem jî li qada hunerê vedigerin. Azadî tiştekî wilo ye. Îcar vî demî ji her demî bêhtir j ime re hostatî divê. Erê ev erdekî beyar e, bi efsûn e lê heke te dest bi ajotinê kir êdî nabe ku xişîmî bikî. Ji ber ku tu çi biçînî tu yê wê hildî.

Berî salan li Ameda rengîn jî mîhrîcaneke fîlman çêbûbû, Van salên dawî dîsa çîdibin û baş in. Erê sal 2012 yan jî 2013 bû. Hingê mîhrîcana fîlman FîlmAmed dibe ku ya yekê ya duyemîn dihat çêkirin. MIn li fîlmdokumanterek temaşe kir. Derhêner ji perspektîfekê tenê çar demsalên xwezaya Dersimê nîşan dabû. Ev di bîra min de maye. Lê ji xeynî wê tiştek din tine. Li vir ez ji bo karê derhêner tiştek nabêjim lê dibêjim ku êdî ew erd ne beyar e. Tu tenê bi nîşandana çar demsalan nikarî çîrokê bibêjî. Elementên sînemayê hene. Dîmen, deng û dînamîzma hunermend û diyalog, helbet hevsengiya navbera wan çîrokî dide temaşekirin.

Bi qasî dîmen ev element jî muhîm in car bi car ev element dibin karakterên sereke jî. Ne lîstikvan lê bûyer lê mekan dibe asasê çîrokê. Bes heke diyalog hebe divê ku diyalog xurt be. Replîk divê xurt bin. Ew diyalog, ew gotin dema bi bûyer û mekan re bi dîmen re dibe yek di hişê mirovî de rûdinê. Di sînemaya me de hîn wisa diyalog û replîkên xurt çênebûne. Yên heyî kêm dimînin. Ev bi krîza vegêrana çîrokê ve eleqedar e. Îcar bi festîvalên tên çêkirin derfet çêdibe ku li rêyên derketina ji krîza vegêranê jî mirov bigere. Ez hemû kedkarên Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Rojava ya 5´an bi wesaîla vê nivîsê silav û pîroz dikim. Berpirsyariya huner kar û barekî giran e serkeftinê ji we re dixwazim.

# Nexweşxana Gel a Qamişlo; ji cihê îşkenceyê veguherî cihê xizmeta mirovahiyê

Rêveberê Giştî Yê Nexweşxana Gel a Qamişlo Bijîşk Ciwan Hemê da zanîn ku ew ê hemû hewildanên xwe bixin xizmeta gel û got; "Tenduristî ne roj û şeveke, em ê jî gavên xwe li gorî derfet û buhabûna qurbaniyên ku vî gelî dane, bavêjin."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Di 5'ê Mijdarê de ji aliyê Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser a Kantona Cizîrê ve, Nexweşxaneya Gel li bajarê Qamişlo ku berê wek Nexweşxaneya Neteweyî dihat nasîn, piştî nûjenkirin û serastkirina wê, hat vekirin. Herwiha Nexweşxana Gel Ya Qamişlo wê xizmetên xwe bi nirxekî sembolîk bi armanca pêşxistina xizmetên tenduristiyê, pêşkêş bike.

**Nexweşxana Gel Ya Qamişlo ji 12 beşan pêk tê ew jî ev in:**

Nexweşiyên hundirîn, lênihêrîna awarte, şewat, nexweşiyên hestiyan, Diyalîza gurçikê (Şûştina gurçikan), guh, Hemû beşên neştergerî (Cîrahî), nexweşiyên jinan û zayînê, beşa alîkariya lezgîn, laboratuar û radyolojî (El-muxteber û Eşîaa). Her wiha 10 klînîk li nexweşxaneyê hene.

Di heman demê de nexweşxane hatiye nûjenkirin û ekîbeke bijîşkî ya pispor ku ji 60 bijîşkên pispor û 60 bijîşkên giştî pêk tê, hatiye erkdarkirin. Desteya Tenduristiyê her wiha 250 karmendên hemşîretî (El-temrîd) û îdarî ji nexweşxaneyê re erkdar kirine.

Li nexweşxane 220 text, 5 ambulans û dermanxaneyek jî hene.



Hemû xizmetên li nexweşxaneyê dê bê pere bên dayîn, ji bilî tomografî (CT) û MR ku dê bi buhayekî erzan bên pêkanîn.

Derbarê vekirina Nexweşxana Gel Ya Qamişlo, Rêveberê Giştî Yê Nexweşxayê Bijîşk Ciwan Hemê ji Rojnameya me re axivî.

**'Nexweşxane cihê işkenceyê bû'**

Ciwan Hemê diyar kir ku nexweşxaneya Neteweyî ya bajarê Qamişlo ku berê di destê rêjîma Baas a têkçûyî de bû, bibû cihê işkenceyê û wiha got: "Di demê ku nexweşxaneya neteweyî di destê rêjîma Baas de bû, ji gelê me tevahî re bibû cihê işkenceyê ne cihê xizmeta tenduristiyê. Di wan deman de nexweş nedikarîn werin vê nexweşxaneyê û tedawiya xwe bikin, ji ber kesên ku dihatin nasnameya wan dihat kontirolkirin û ji ber gelê me piranî lêxwaz (metlûbê) dewleta Baasê bûn, lewma wan nedikarî werin. Herwiha nexweşên ku dihatin nexweşxaneyê jî piraniya wan dihat girtin. Demekê jî nêzî 10 bijîşkên me jî li vir hatin girtin ku ji hemû pêkhateyan bû û ew birin leşkeriya neçar, yek ji wan bijîşkan 8 salan leşkeriya neçar kir. Ev rêbazê rêjîmê di warê tenduristiyê de bû ku dihate meşandin."

**'Cenazeyên nenaskirî di jêrzemîna nexweşxaneyê de hatin dîtin'**

Hemê eşkere kir ku piştî hilweşandina rêjîmê di nexweşxaneyê de cenazeyên hilyayî hatin dîtin û wiha anî ziman: "Dema rêjîma Baas hilweşiya û reviyan, gelek cenaze di jêrzemîna nexweşxaneyê de hatin dîtin. Ew cenaze hilyayî bûn û nema dihat xuyakirin ku ê kê ne. Ji bo wê dema em hatin nexweşxaneyê, nexweşxane xirabûyî bû ku bi kemyonan qirêj ji nexweşxaneyê hate derxistin, herwiha gelek caran jî hat şûtin û paqijkirin, lê hîna jî gelek jêr pêwîst dike ku baş bê paqijkirin. Dîsa jî proja me ku me bi gelek bijîşkên pirpor re peyman kir, lê hin alavên me kalîber (Iyarkirin) ji wan re divên, ev jî wê çend rojan û bên amadekirin. Tiştên me yên heyî ku têne xibitandin renîn, Tebeq muhwerî, şûtina gurçikan, herwiha emeliyat çêdibin wek merara, qeyseriyê û çend emeliyên guh jî hene. Klînîkên me yên derve jî dixebitin."

**'Malbatên şehîdan bê dirav werin tedawîkirin'**

Hemê di dewamkirina axaftina xwe de da zanîn ku li cîhanê giştî pêwîst dike zindanek di nexweşaneyan de hebe, lê ne bibe cihê işkenceyan û wiha domand: "Niha li cîhanê tevahî li her nexweşxaneyekê zindanek heye, heta divê ku li nexweşxaneyên Rêveberiya me ya Xweser a taybet jî zindanek tê de hebe, ji ber hinek hebsî hene sûcên cînaî kirine. Ji bo wê dema ku ew hebsî nexweş dibin tên nexweşxaneyê, lê nabe ku ew di nava nexweşên din bê hiştin, ew li zindana nexweşxaneyê tê hiştin, heta navenda ewlekariyê jî dibê di nexweşxaneyê de hebe. Lê zindana di nexweşxaneya netewî ya Qamişlo di dema rêjîma Baasê de, bibû navenda işkenceyê ku yê dihate wir, dihat girtin û ew dixistin wê zindanê de û bi şevê bi rêya balafiran ew dibirin aliyên Şam û hwd….

Lê niha piştî nûjenkirin û serastkirina me ji nexweşxaneyê re, em ê bi hemû hewldanên xwe wê bixin xizmata gel de ku buhayekî sembolîk ji nexweşan werbigirin. Herwiha ji bo malbatên me yên şehîdan jî çi tiştên ku li nexweşxaneyê heye em bi wan re parve dikin, wekî ku niha renîn bi dûrê ye, lê yên malbatên şehîdan dûr ji wan re navê kengî kazexa xwe bînin û derfet hebin, em ji wan re digirin û bê dirav. Di heman demê de emeliyat û tebeq muhwerî jî bi vî rengî ye. Ev ne minetdariyeke, lê ev erkekî me ye ji ber bi xuyîna zarokên wan em li vir rûniştine. Dermanxaneya li nexweşxaneyê jî taybet pê ye ku bêtirî xwe derzî lê hene, ew jî ji bo karê emeliyat û ji bo nexweşên ku li nexweşxaneyê razayî ne."

**'Bi hewldanên xwe di siberojê de gelek aliyên tenduristî pêk bînin'**

Ciwan Hemê axaftina xwe wiha qedand: "Daxwaza me ew ku Nexweşxana Gel a Qamişlo di siberojê de, bibe navendek tenduristiyê li şûna gelên me berê xwe bidin Şam û hwd… em li vir bi xwe karibin gelek aliyên tenduristiyê pêk bînin û bi rengekî serkeftî. Tenduristî ne roj û şeveke, gav in em ê jî gavên xwe li gorî derfet û buhabûna qurbaniyên ku vî gelî danîne, bavêjin."

# Tevî zehmetiyên koçberiyê jî malbatên Efrînî çavkaniyek debarê peyda dikin

**Esmehan Gedro/Reqa**

**Di nava zehmetiyên koçberiyê de, malbatên Efrînî yên ku li dibistaneke bajarê Reqayê bi cih bûne ji bo debara jiyanê çavkaniyekê peyda dikin. Jin bi zarokên xwe re zeytûnan ji hev cûda dikin û di kîsên bilastîk de bi cih dikin.**

Ji bo koçberên Efrînê, zeytûn ne tenê çandinek e, ew bîranîna axê û dewlemendiya bajarê wan e.

Malbatên ku bi zorê ji herêmên Efrîn û Şehbayê koçber bûne, piştî ku dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ew neçar kirin ku ji malên xwe derkevin û bikevin çerxek dubare ya koçberiyê û zehmetiyên derketina ji malên xwe, karibûn li bajarê Reqqayê çavkaniyek debarê ya zêytûnan bibînin.

Li Dibistana Hesen Ibn El-Heysem a li kantona Reqayê, jin bi zarokên xwe re kom bûne, zeytûn ji hev cuda dikirin û piştre wan di kîsên plastîk ên zelal de bi cih dikin.

Curekirina zeytûnan ji bo gelek malbatên ji Efrîn koçber bûne bûye çavkaniyek dahatê. Karê wan bi valakirina zeytûnan li ser hesîrên plastîk li hewşa Dibistana El-Hesen Ibn El-Heysem dest pê dike, piştre, zeytûn ji pel û qurmên wê tê baqijkirin.

Dûv re jin zeytûnan rêz dikin, yên xerabûyî û yên guncav ji hev cûda dikin. Zêytûnên guncav jî dikin du beş, beşek ji bo muneta xwarinê û yê din jî ji bo guvaştinê û derxistina zeytê. Li ser vî karî jin ji bo her kîloyekê hezar lîreyên Sûrî distînin.

**Zeytûn... Hizra axê û çîroka koçberiyê ye**

Ji bo koçberên Efrînê, zeytûn ne tenê çandinek e, ew bîranîna axê û dirêjkirina rehên ku qet namirin e. Gelek ji wan piştî koçberiyê baxçeyên xwe yên li Efrînê winda kirin, lê dîsa jî tovên wê di dilê xwe de li ber destên xwe digirin.

Yek ji koçberên Efrînê ku li Reqayê dimîne Mûnzêr Bulbul derbarê mijarê de ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Dema ku ez dest didim zeytûnekê, ez hest dikim ku ez destê xwe didim axa gundê xwe û ji van tovên piçûk wêdetir tiştek nikare me bi berê ve girêbide."



Mûnzêr Bulbul di dewama axaftina xwe de wiha got: "Jin û zarok heta kal û pîrên me dixebitin ji bo karibin debara xwe ya hevkariya jiyanê bikin. Xebat di saetên serê sibê de di nava atmosfereke tijî bêdengî de ji bilî dengê zeytûnan ku di sindoqê de dizivirin an jî di kîsan de tên rijandin dest pê dike. Tiliyên jinan bi zeyta zeytûnê dibiriqin û rûyên zarokan bi şermokî ronî dibin."



# 'Piştî gava 26'ê Cotmehê divê Tirkiyê çarçoveyekî siyasî û zagonî ava bike'

Parlamentera DEM Partî ya Şirnaxê Newroz Uysal da zanîn ku gava 26'ê Cotmehê wê pêşî li nîqaş û gumanên dewletê li ser çareseriyê û nêzîkatiya Tevgerê bigre û got, "Komisyon divê dem û meseleyê dirêj neke, bikaribe çarçoveyekî siyasî û zagonî ava bike û gavên rast biavêje."

**Zana Roj**

Bi destpêkirina banga Aştî û Civaka Demokratîk re, Tevegra Azadiyê li ser banga Rêber Abdullah Ocalan gelek gavên biheybet yên çareseriyê mayênde dikin avêtin. lê belê dewleta Tirkiyê pêvajoyê bi giranî bi rêve dibe û tu gavên berbiçav nehatine dîtin. Bi vê yekê Parlementera Dem Partiyê ya Şirnaxê Newroz Uysal bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyîvîn wiha bû:

**Pêvajoyekî dîrokî ku çarçoveya siyasî, zagonî û navxweyî a Tirkiyê guhart, ew jî banga "Aştî û Civaka Demokratîk" a Rêber Abdullah Ocalan e. Di serdemekî ku em dibin şahidê van guhartinan, hûn vê gavê di asta giştî de çawa dinirxînin?**

Belê; Di pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de gaveke din a dîrokî ku di 26'ê Cotmehê de ji aliyê Tevgera Azadiyê ve hat avêtin. Ev gav jî bi armanca berdewamkirina pêvajoya ku hatiye destpêkirine, pêşketina asta heyî, her wiha di gavên ku werin avêtin de nîqaşên navxweyî yên di Tirkiyê û di nava Tevgerê de tên kirin wê heyanî kîjan astê berdewam bikin dide nîşandin, gelekî girînge helbet. Ev pêngav him ciddiyet, nêzîkatî û biryardayîna Tevgerê li hember bangewaziya Rêber Apo a 27'ê Sibatê, dide xuyakirin. Him jî biryardariya xwe ya piştî berdewamkriina pêvajoyê, helwesta xwe ya ji bo çareserî û aştiyê dide tekezkirin.

Ji ber wê jî pêngav û gavên dîrokî ji bo pêvajiyê pêş dikevin. Ev pêngav ji bo serxistina vê merhekeyê û gihandina çareseriyeke mayînde wê ji bo gavavêtinên hîn mezintir, wê hêz û casaret be.

**Li ser bingeha vê banga dîrokî, du gavavêtinên dîrokî ji aliyê Tevgera Azadiyê PKK'ê ve hatin avêtin. Ev du gavên dîrokî wê bandoreke çawa li rewşa Tirkiyê û çareserkirina pirsgirêka Kurd wê bike?**



Di guhartin û pêşketinên destpêkê yên vê pêvajoyê de, tenê daxwaza pêşketinên di vê pêvajoyê de mayîn nirxandin, em ê kêm bimînin. Ji ber ku çareseriya doza Kurd, guhertina rêbazê têkoşînê, guhartina heyîna Tevgera Azadiya gelê Kurd yê ku ji destpêkê û heyanî niha di nava guhertinê de; Xwe ji nû de vejîn dike û li gorî wê rêbaz dihuherîne. Ev hemû ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û him jî ji bo Tevgerê, mijarên sereke bûn. Li ser vê bingehê ev gavên ku tên avêtin, ne tenê di vê pêvajoyê de em bidin pênasekirin, lê belê li ser lêgerîna azadiyê û aştiyê zêdetirî 30 salî ye. Her wiha ji dest pê kê ve di îradeya çareserkirinê de heyanî niha berhemên têkoşîn û kedê yên herî mezin avakirine. Ev her du gav him guhertinsa têkoşîna Tevgera Azadiyê dide xuyakirin ku ji rêbezê şer ber bi rêbazê çareseriya demokratîk ve diherike û esas digre. Ji ber bi taybet di Tirkiyê de bi sala ye rêbazên siyasetê, him di nava rêveberiya herêmî, him li parlementoyê, sazî û qadên cuda de guhertinên siyaset û di nava civakê de tên xuyakirin. Xwe dispêre avakirina bingeha wê ya demeke dirêj.

Ji ber wê ev gavên dîrokî yên ku hatien avêtin him şewtandina çekan û him vekişîna ji Bakurê Kurdistanê, bandoreke erênî li Tirkiyê di çareserkirina pirsgirêkê de dike. Ji ber ji destpêkê ve û heya niha gumanên gelê Kurd li hember Tirkiyê hene. Helbet rast e, neavêtina gavên pêwîst rexne dikin. Her wiha ji aliyê dewletê ve jî gumanên li hember Tevgera Azadiyê gelek zêde hebûn. Ev nîqaş demekî dirêje tên kirin, ka wê gavekî çawa bê avêtin wê komsyon çi biryaran bide. Ji ber wê ev gava 26'ê Cotmehê ji bo wê bandorekî gelek mezin li pêvajoyê wê bike him di aliyê nava Tirkiyê de û him jî derve de ku wê pêşî li nîqaş û gumanên dewletê li ser çareseriyê û nêzîkatiya Tevgerê bigre. Her wiha weke Tevgera Azadiyê û hevdîtinên bi Rêber Apo re bên pêşxistin. Êdî gelê Kurd di hemû aliyan de îrada xwe dane nîşandan, banga xwe kirine û xwe zelal kirine. Lê di aliyê desthilatdarî û dewleta Tirkiyê de hinek gotin hene, gavên şênber nîn in. Ev yek jî nakokiya ku tê jiyankirin radixe ber çavan.

**Rûxmî avabûna Komisyona ji bo rêvebirina vê pêvajoyê di Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê de, lê rêveçûneke giran xuya dike, gelo hûn vê yekê çawa dibînin?**

Komisyona ku hatiye avakirina ji pêkanîn û meşandina xebatên hiqûqî û zagonî di çarçoveya ê pêngavê de hate organîzekirin, ev komisyon zêdeyî 3 heyva ye hatiye vakirin. Lê belê komisyonê tenê di aliyê guhdarkirina kesayet, alî û saziyan re sînordar ma. Heyanî niha tenê carekê weke komisyom ji Amedê re ziyaretek pêk aniye, derveyî vê tu xabatekî berbiçav û cidî nedaye destpêkirin. Di aliyê cih, nêzîkatî û nîqaşan de teng ma. Hemû nîqaşên ku ji aliyê saziyan ve di wir de hatine kirin, di çarçoveyeke berfireh de bûn. Him ji bo çareseriyê him ji bo dagirkeriya li ser Kurdistanê, nêzîkatiyê ji gelê Kurd re, hewcedariyên zagonî her wiha tecrîd û azadiya fîzîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocana, ji laiyê dayîk, ciwan, kesên naskirî ve pêş ketin. Di çarçoveyekî berfireh de nîqaş hatin kirin, lê komisyon bi xwe di aliyê nêzîkatiyê û bersivdayînê de teng ma. Mijar weke mijarekî welehiyê û leşkerî hate destgirtin. Li gor vê jî hewcedariya ku bê kirin di aliyê mijara piştî çekdanînê û Tevgerê de divê çi bê kirin, mijar bi vî rengî hat destgirtin. Niha komisyon xwe bi wê sînordar dike, zêdetir di aliyê nîqaş û guhdarkirina mijarên ku ji aliyê civakê ve hatine kirin; Mixabin têr nekir û nagrin dest. Me dît ku çawa li hemer axaftina bi zimanê Kurdî li hember dayîkan bûn asteng.

Taybet muxatebê bingehîn yê vê pêvajoyê Rêber Apo ye, ger em bêjin sê faktorên sereke yên vê pêvajoyê hene, bi ser navê dewletê dewlet Bexçelî, ser navê desthilatdariyê Erdoxan, bi ser navê Tevgera Azadiya Kurd û Gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan e û aktorekî di girtîgehê de heye ku hê tecrîd li ser wan berdewam dike, ger tu weke komisyon neçî û hevdîtinan bi wan re nekî, di serî de tu li ser xwe û nêzîkatiyên xwe guman û şubhetan çê dikî. Ji lewra ev guman nehatine derbaskriin, serlêdanên komisyonê nehatine kirin. Partiya AKP'e rasterast rengê xwe diyar nekir, CHP'e dudilî ye, lê belê hemû partiyên din çûyîna giravê weke gav û hewcedariyeke bingehîn ji vê pêvajoyê re dixwazin. Ji ber wê derengxistina van gavan ji aliyê komisyonê ev, guman ava dike û bandorê li ser rastiya wê dike.







Lê piştî vê gavavêtina dawiyê ya vekişîna ji sînorên Tirkiyê bi awayekî fermî ku ji raya giştî re hat parvekirin, êdî komisyon divê dem û meseleyê dirêj neke, bikaribe çarçoveyekî siyasî û zagonî ava bike û gavên rast biavêje.

**Piştî Banga dîrokî, şewtandina çekan û vekişîna Gerîlla ji Bakurê Kurdistanê, Erk û berpirsyartiyên hiquqî û zagonî yên ku dikevin ser milê dewletê çi ne?**

Erk û berpirsyartiyên hiqûqî him ji bo komisyonê û him ji bo meclisên em dikarin bigrin dest, yekemîn divê komisyon êdî zagonên taybet ango zagonên li gorî hewcedariya pêvajoyê, bi awayekî nîqaş werin diyarkirin û di wê çarçoveyê de dibêjin wê rapor amede bikin û di meclisê de parve bikin. di çarçoveya hewcedariyên siyasî de, yê ku herî zêde zelal û net xwe nîşan daye, DEM partiye. Lê helbet em li ser çareserkirina meseleya Kurd bifikirin û hewcedariya wê ya zagonî, gelek xal hene. Ji kar û xebatê civakê, zimanê Kurdî, birêvebirina şeredariyan, pêşxistina xebatê çand û hunera Kurdî, statubûyîna hemwelatiyê li Tirkiyê were nasîn, ev hemû bi hev ve girêdayî ne. Lê wek komisyon û gavên yekemîn yên ku pêk bîne çi ne. Di serî de tekez divê rewşa Rêberê Gelê Kurd bê guhartin û deriyê azadiya fîzîkî bê vekirin. Ya duyem divê çarçoveya zagonî bi tayebt ji bo Gerîllayên Tevgera Azadiyê ku vegerin û tevlî jiyan û siyasetê bibin, were diyarkirin. A sêyem divê li pêşiya siyaseta demokartîk bi awayekî zagonî bê vekirin. Em dikarin bêjin ku demildest tişta ku bê kirin ev e. Tiştên piştî wê jî weke gava duyemîn, divê vekişandina qeyûman li ser şeredariyan, bê dayîn. Her wiha li ser hemû sazî û navendên kar û xebatê yên ji bo ziman, çand û hwd.. zext û tacîz bên rawestandin. Biryarên dadgeha mafê mirovan yê Ewropayê û Mafê Hêviyê yên ji bo girtiyên di girtîgehan de, siyasetmedar, yên nexweş û hwd.. hemû werin berdan. Helbet gelek tiştên din û hurguliyên ku ji mafê gele, hene. Ger dewlet bi van gavên destpêkê xebat meşand û pêk hatin, wê demê li ser danîna bingehên dim mirov dikare nîqaş bike.

# Entegrasyona Demokratîk yekîtiya gel e

Rêber Apo di Manîfestoya bi ser navê Aştî û Civaka Demokratîk ku ji kongra 12'mîn ya PKK'ê re şandibû bal dikşîne ser entegrasyona demokratîk û wiha dibêje: "Entegrasyona demokratîk tê wateya civateke demokratîk bi dewlet netewî re."

**Tekoşîn Amara**



Entegrasyon bi gelemperî behsa beşdarbûna civakek an kesekî di pergala heyî de dike. Di bingeh de di ahenga civakî de ji çanda hevdûre rêzgirtin û hevqebûlkirin bi hirmet dayina fikirê hev jiyankirin e. Entegrasyon ji aliyê Rêber Apo ve wekê rêya çareseriyê di dema pêvajoya aştiyê de hat destnîşankirin û tê nîqaşkirin. Ew armanc dike nasnameyên cihêreng, bi taybetî Kurd, di nav avahiya netewedewletê de li ser bingeha wekhevî û xwebûnê entegre bike. Piştî ku Rêber Apo bal kişand ser entegrasyonê hin zêdetir nîqaşên entegrasyonê hatin kirin û ket rojeva cîhanê.

### Entegrasyona demokratîk çi ye?

Entegrasyona demokratîk tê wateya kombûna civakên cihêreng di nav yek civakê de, lê ev yekîtî ne bi rêya zordarî an tepisandina nasnameyan e, lê li ser bingeha azadî û rêzgirtinê çêdibe. Bi gotineke din, ev model avakirina civakek cihêreng û pirçandî di nav rêzek demokratîk de ye. Di vê têgihîştinê de, her kes dikare bi awayek azad ziman, çand, bawerî û nasnameya xwe biparêze, di heman demê de, her kes li ber qanûn û mafan wekheviyê distîne. Armanca entegrasyona demokratîk ew e ku hevsengiya civakî, azadî û wekheviya giştî bi hev re bike; ew kesî neçar nake ku "li gorî nasnameyek yekan e" tevbigere.

Rêber Apo entegrasyonê wiha îfade dike, " Entegrasyon te wateya yekbûna civateke demokratîk bi dewleteke neteweyî re. Ev pênaseya herî rast e. Civatek xwe wekî dewletek rêxistin nake û xwe bi dewleteke din ve girê nade. Ew xwe wekî civateke demokratîk di nav komara demokratîk de entegre dike. Entegrasyon wekheviyê jî dihewîne. Ew bi rêya danûstandinên demokratîk tê damezrandin. Entegrasyon danûstandinên demokratîk pêwîst dike. Danûstandina demokratîk entegrasyona civateke demokratîk û dewleteke neteweyî misoger dike." Rêber Apo entgrasyonê ne tenê ji bo Kurd û Tirkan pêşniyar dike, lê ji bo çar parçê Kurdistanê pêşniyar dike.

### Rêber Apo; Entegrasyon ne asîmlasyon e

Têgeha "entegrasyona demokratîk" di rastiyê de di navbera du modelên tundrew de ye asîmîlasyon û pirçandiyê ye. Asîmîlasyon daxwaz dike ku her kes dev ji nasname, ziman û çanda xwe berde ya dijber qebûl bike. Ji aliyê din ve, pirçandî dikare bibe sedema ku kom bi tevahî îzole bibin û têkiliyên civakî qels bibin. Rêber Apo di Manîsteyo de wiha dibêje" Entegrasyon ne asîmlasyone berovajiya asîmlasyonê ye. hindek kes dixwazin entegrasyonê wek asîmlasyonê şîrove bikin. lê em, berovajiya vê, li dijî asîmlasyonê liber xwe didin. Jibo derbaskirina vê danûstandineke demokratîk hewce dike. Dewlet hertiştê ferz dike û bi zilmê pêk tîne, ev nayê qebûlkirin, Entegrasyona civaka demokratîk bi dewlet netewî re bi rêya dayin û standinê Demokratîke".

### Çend xalên bingehîn ên entegrasyona demokratîk

1-Entegrasyona demokratîk wekheviyê dihewîne û bi rêya muzakereya demokratîk pêkan e. Muzakereya demokratîk yekbûna civaka demokratîk û dewleta neteweyî misoger dike.

2-Entegrasyona demokratîk dijberî asîmilasyonê ye. Têgeha entegrasyona demokratîk ahengeke li gor vîna civakan, pêkve jiyaneke ku gelê Kurd bi çand, ziman, nasname û baweriyên xwe bijî û van nirxên xwe biparêze esas digre.

3-Entegrasyona Demokratîk ew formula çareseriyê ye ku Kurd bêyî dewleteke neteweyî avabikin, bi deweletên di nav sinorên wan de dijîn re li ser rêgezên wekhevî û demokrasiye li hev bikin û hevdu qebûl bikin.

### Pîvanên entegrasyona demokratîk çi ne?

Pîvana entegrasyona demokratîk jî gaveke girîng vedibêje ku nikare ji li ser daxwazên netewe dewletan re bê hiştin. Di vir de, ji bo civakek di nava civakeke din de asîmîle nebe, neyê helandin divê qanûn bê bikaranîn. Ji ber vê yekê eleqeya xwe bi wê têgeha modernîteya kapîtalîst nîne. Ev qanûnên ku li cîhanê jî mînakên wan hene, weke hêmanên bingehîn ên sîstemeke konfederal in.

Lewma qanûnên têkildarî entegrasyona demokratîk gelekî girîng in ku nabe ji xwediyên hêzê re bêne hiştin. Hin tiştên bingehîn ên ku di qanûnên entegrasyona demokratîk de divê bi cih bêne anîn bi vî rengî ne;

- Nêzîkatiyeke li ser bingeha mafên mirovan
- Hevparebûna li ser nirxên hevbeş
- Parastina nasname, ol û çanda kes û civakan li hemberî asîmîlekirinê
- Pîvana wekheviyê, komek di vê ji komam din bi hêztir nebe
- Bi qanûnên entegrasyona demokratîk re hevpariya li nava jiyana rojane û pêşîgirtina li metirsiya cihêkariya li nava jiyana civakî
- Bicihanîna qanûnên entegrasyonê bi rengekî lez û rast
- Qanûnên entegrasyona demokratîk, dema ku kes zanibin ku ji civaka li nav e û cihêkarî lê nayê kirin, hingî bi rengekî rast bi pêş ve diçe. Di vir de eger ev qanûn di nava netewe delwetê de be, divê yên ku li ser desthilatdariyê ne xwe ji polîtîkayên cihêkariyê vegirin û destûrê nedin cihêkariyê.

### Entegrasyon di komareke demokratîk de pêkan e

Rêber Apo di nirxandinên xwe de şert û mercên entegrasyonê lêpirsîn dike û di derheqê entegrasyona demokratîk de wiha dibêje: "Siyaseta demokratîk di komareke demokratîk de pêkan e. Ger komar demokratîk nebe entegrasyon pêk nayê, entegrasyon bi komara faşîst re çênabe. Ji ber vê yekê, hevwateya siyaseta demokratîk Komara Demokratîk e û entegrasyon pê re tê çêkirin. Gelo entegrasyon bi rastî mimkun e. Gelo desthilatdarî ji entegrasyonê re amadeye, şert û mercên vê hene."

### Ji bo pêkanîna entegrasyonê hişmediya pêwîst

Bêguman ji bo ku entegrasyon pêk were ewilî pêwîstî bi guhertina hişmendiya dewleta tirk û civaka tirk (bêguman qesta me ne hemû civak e) ya ku bi sed salan e gelê Kurd înkar dike, tune dihesibîne û hewl dide hemû nirxên gele Kurd asîmile bike heye.

Divê dewleta Tirk, gelê Kurd û hemû etnîsîte, ol û baweriyên cuda ji bo hebûna netewedewletê wek tahlûke û dehdît nebine; wek dewlemendiyeke civakî bibine û bigre dest.

Divê dewlet daxwazên gelê Kurd yên bi çand û zimanê xwe, bi nasnameya xwe bi awayekî azad jayana xwe ava bike qebûl bike. Hişmendiya ku di pêşiya van daxwazan de asteng e biguhere û li dij van mafên bingehîn yên însanî hestiyar be. Divê dewlet dev ji manîpulekirina civaka Tirkiyeyê, fikir û hestên ku gelê Kurd terorîze dike, wî paşverû, bêçand û bêziman nîşan dide berde.

Lazime dewlet ji vî şerê ku 50 sal in didome û him ji bo gelê Kurd, him ji bo hemû gelên li Tirkiyeyê dijîn bûye sedema berdêlên giran, him jî ji mînakên dinyayê ders derxe û bi feraseteke baqil tevbigere. Divê dewlet êdî qebûl bike ku bi şer, qirkirin, talan û bişaftinê nikare encam bigre.



## Ma heta kengî şerxwazî?

**Ahmet Aktaş**

Di 11 Mijdara 2025 de, nuçeyek balkêş di medyayê de derket pêş ku frokek şer a Tirkiyê di nava sînorê Gurcistanê-Azerbeycanê-Ermenistanê de ket xwarê, 20 fermandarên arteşa Tirk jiyana xwe ji dest dan!

Hema li pey vê nûçcyê hemû rayedarên dewleta Tirkiyeyê, ev bûyer xistin mijara sereke ya rojevê û peyamên şerxwaziyên nijadperestî û pesindariya leşkerê Tirkan rêz kirin.

Vê bûyerê, ew bûyera 6ê Tîrmeha 2025an anî bîra me ku, ji bo laşê fermandarekî xwe bigrin bi hêzek mezin çûbûn şikefta herêma Pençe-Kilit a Botanê û li wira 19 esker, bi Xaza Metan jahrî bûbûn û ji wana 12 esker jiyana xwe ji dest dabûn.

Li wira, carek din dewlet ket kemîna xwe ya xaza kimyewî, ku avêtibûn ser gerillayê Tevgêra Azadiyê.

Li ser van 20 fermandarên ku di firokê de jiyana xwe ji dest dan, Azerbaycan Report dibêje "vana pisporên firokên F-16 bûn û li gel Receb Erdogan çûbûn pîrozbahiya serkeftina salvegera 5an, a Qerebaxaçiyayî ya 8ê mijdarê li Bakuyê, dizîviriyan Tirkiyê".

Her wiha tê gotin ku barê vê firokê hemû amûrên şer bûn! Ev bûyera, ketina Helikoptera Reisiyê Îranê tîne bîra mirovan, ji ber ku ew jî ji Azerbeycanê dizîvirî Îranê!

Li aliyê din, salek derbas bû ku pêvajoya çareseriyê hatiye despê kirin.

Di qonaxa yekê de aliyê Tevgêra Azadiyê, barê hildaye ser mîlê xwe zêdetir pêkaniyê.

Lê aliyê dewletê, li paş maye, bi dudilî dimeşe. Bi tinê komisyona Parlemenê ava kiriye û hinek hewladanên pozitif jî kiriye.

Diviya vê hefteyê, weke karekî sereke ji bo çûna ba Rêber APO bi civiyan belê neciviyan, bûyera firokê û mirina fermandarên xwe sedem nîşan dan, tê gotin ku 18ê vê mehê li ser vê mijarê dicivin.

Bi kurtayî xemsarî û dudilî heye di meşa wan de, ev jî, rê li ber şerxwazan û provakatoran vedike û weke ku Duran Kalkan jî bi xurtî li ser rawestiya ye; zemînê ji rantkaran re xweştir dike!

Van hilwestan, ew çûna Receb Erdogan a ji bo şahiya pîrozbahiya bi destxistina Qerebaxê û bûyera firoka wan, gûmana ku hîn jî, him li hundur û him li derve çendîn aligirên şer in didin nîşandan.

Her wiha, çi cih û civînên ku gûmana şer lê hene, Hakan Fidan baz dide wira, gah li Rojhilata Navîn, gah li Efrîqa û niha jî li Emerîqa di nava civîna Trump û Golanî de, mîna şowmenekî şer, bejna xwe nîşan dide!

Li aliyê din, gotinên Zalmay Xelîlzadeyê Balyozê DYE yê kevn ê Iraqê jî balkêş û giring e, piştgriya HSDê dike û dibêje; "ji bo Kurdên Sûriyeyê fedralîzim " baştir e!

Aliyê dewletê, him bi gotin pêvajoyê û aştiyê diparêzin, him êrîşên xwe yên dijî Kurdan bi temamî ranawestînin.

Li goreyî Kamuran Osmanê CPTê, li Başûr, dewleta tirka 139 baregehên leşkerî ava kirine û bi dehan gund vala kirine û hwd.

Îca rayedarên dewletê dibêjin; "teyrê aştiyê bi du bazka ne", bazkê Tevgêra Azadiyê temame, lê bazkê dewletê bêtaqete, siste, lewma TEYRÊ AŞTIYÊ nikare bifire..!

Ma heta kengî durûtî? Êdî bi zihniyeta şerxwaziyê re meş nabe, divê xwe sererast bikin.



# Hesen Ferhan: Rêveberiya Xweser nûnertiya tevahî pêkhateyên herêmê dike

Serokê Qebîleya Tay Şêx Hesen Ferhan Ebdullrehman da zanîn ku ew amadene li ser dezgehên ragihandinê yên hundir û derve derkevin û bêjin "Projeya Netewa Demokratîk projeye demokrasî û nenavendîbûyînê ye ku tenê bi vê projeyê dikare Sûriyê ber bi çareseriyê ve biherike."

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Di van demên dawiyê de ji aliyê komên birêxistinkirî yên girêdayî hikumeta vegyhêz li hember Rêverberiya Xweser û hêzên QSD'ê Şerê Taybet li ser medya dijîtal pir zêde bûye ku bi vê yekê eşîran li hember Rêveberiya Xweser sor dikin, Têkildarî vê mijarê Serokê Qebîleya Tay Şêx Hesen Ferhan Ebdullrehman bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû.

**Ji destpêka Şoreşa 19'ê Tîrmehê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û vir ve, eşîr mil bi mil li kêleka Rêveberiya Xweser û hêzên wê yên leşkerî sekinîn da ku herêmê biparêzin û komployan pûç bikin. Hûn têkiliya xurt a di navbera eşîrên herêmê û Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de çawa dinirxînin?**

Beriya her tiştî ji hemû eşîrên herêmê li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ciwanên me di nava Hêzên Leşkerî de cihê xwe digrin. Li kêlek pêkhateya Kurd, Suryan, Ermen, Êzdî û hwd.. cih digre û şer dike. Hêzên Sûriye Demokratîk bi wateya xwe ya cewherî em dikarin bêjin hêza hemû gel û pêkhateyên herêmê ye, ji ber ku ji pirrengiya herêmê hatiye avakirin û xwe da ye îsbatkirin. Ji ber wê em weke Qebîleya Tay ya ku ji 14-15 eşîran pêk tê, em hevgirtina xwe bi QSD'ê re dikin yek û ev yek bi serê xwe wêneya herî rast a xurtbûn û têkiliya di navber Rêveberiya Xweser û Eşîran de ye. Li tevahî herêmên Rêveberiya Xweser û bi taybet herêma Cizîrê, bi sedan qebîle û eşîr hene. Ji destpêkê de û heyanî niha tu pirsgirêk, nakokî yan jî şerek di navbera tu eşîr û rêveberiyê de çênebûne. Hinek pirsgirêkên tekekesî çêdibin, ew jî şerme em behsa wan bikin. Hinek alî hene ku dixwazin fitne û axaftinên bi zimanê kîn û nefretê derxînin holê nemaze; bêjin ev Kurd e, Ereb e, Xiristiyan e, Musliman e, Êzdiye û hwd.. Erê rast e ez Ereb im, ez Xiristiyan im, ez Kurd im. Nabe ku em derveyê cewher û eslê xwe derkevin. Lê belê; Dema ku ez Kurd bim ez Ereban qebûl dikim, ez Ereb bim ez Xiristiyana qebûl dikim û her wisa. Di vî alî de herêma me di îstiqrarê de ye, hurmet û rêzgirtin di nav hemû pêkhate û eşîran de rêgezeke bingehîn e.

Hukmekî dîktator ku nêzî 60 salî li ser hemû gelan û netewan di Sûriyê de dihat meşandin, tu maf û hêviyên serxwebûnê nedida kesî ev yek li ser hemû pêkhateyên di Sûriyê de hatibû meşandin. desthilatdariyeke pir xurt û bi bingeh bû. Em ne li dijî dapeşkirin û perçekirina Sûriyê ne. Lê belê; em dibînin ku Projeya Netewa Demokratîk, tevê ku pirojeyekî pir nerme û carnan hin pirsgirêkên biçûk derdikevin nemaze; berçavgirtina rewa eşîran de. Lê belê; bi awayekî giştî Projeya Rêveberiya Xweser projeya herî zêde ku bpye hêza çareserî û avakirinê bêyî ku mafê tug elan biçewsîne ango tune bike ye. Bi taybet di aliyê jin de hebûn û cihekî pir mezin da ye wê. Jin; Dayîk, Xwîşk, hevjîn û Keçika min e. A ku min temam jî dike; jin e. Bi hatina hikumeta nû ya Sûriyê re, em bûn şahid ku çawa li Berava Sûriyê û Siwêdayê li ser gelê Elewî û Durzî pêkanîn û kiryarên dijmirovê derheqê jin, kesên temen mezin û rûsipyan de kirin, Simbêlên kesên mezin yên ku weke kevneşopî û rpmeta xwe dibînin, ji aliyê komên çekdar ve hatin jêkirin. Herlbet ev yek nayê qwebûlkirin. Em bala xwe bidinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê her kes bi xwezaya xwe, girtî yan vekirî, cil û zimanê kîjan pêkhateyê diaxivî, çi ol û mezhebî esas digre, tu kes destwerdan nake û ev yek dibe bingeha serxistin û pejirandina vê projeyê. Têkiliyên di navbera Ereb û Kurdan de ji bingehtirîn û dîroktirîn têkiliyan e.

**Hin hêzên herêmî hewl didin ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di navbera pêkhateyên herêmê de nakokiyan biçînin da ku aramî û ewlehiyê têk bibin. Kîjan hêz li pişt vê gurkirina şer û Şerê Taybet in, her wiha armanc û berjewendiyên wan çi ne?**

Ji hundir û derveyî Sûriyê hin alî hene naxwazin aramî û ewlehî bê avakirin. Ji hundir ve hin alî û kom hene ku nûnertiya gelê Sûriyê nakin, rewşeke tevlîheviyê û fitnê di navber pêkhateyan de derdixînin. Ji xwe armanca me ya yekemîn jî ku diyaloga Sûrî Sûrî di navbera rêveberiya Xweser û hikumeta nû de bihata avakirin. Her wiha ji aliyê derve de hin welat destwerdanê li Sûriyê dikin ku ew jî naxwazin çareseriyek mayînde bê avakirin. Ji van dewletan a herî sereke jî, Tirkiyê ye. Tirkiyê aliyê yekemîn a ku piştgiriya Terorê dike û rê nade ku istiqrar di Sûriyê de ava bibe. Her çiqas hewil da ku eşîran bi kar bîne, lê di vê leyîstoka xwe de biser neket.

Me dît ku hinek meş li hin herêmên Sûriyê li dijî Rêveberiya Xweser hatin organîzekirin. Li hember vê yekê me jî dikarî ku li hember wan hewildanan meş û çalakî lidarxistibana, ger em bangawaziyekê bikin wê bi milyonan eşîrên Ereb û Kurdan derkevin. Lê belê em naxwazin teşe û giraniyekê bidin van piratîkên biçûk yên bê wate. Rastiyeke vê hêzê û rêveberiyê heye k ukes nikare înkar bike, QSD'ê li hember terora herî xeternak li ser rûyê erdê DAIŞ şer kir û têk bir. Ev bi serê xwe têrkere ku di herêmê de istiqrarê ava bike. Di navbera eşîrên Kurdan, Ereban û partiyan de yekbûn û entegrasyoneke pir xurt heye, her kes bi pilan û armancên wan aliyên dixwazin vê projeyê têk bibin, serwextin.



**Bi berçavgirtina gotinên nefretê yên ku li ser medyaya civakî belav dibin û ji hêla hin dezgehên medyayê yên bi pere ve têne pêşve xistin da ku dabeşbûnê biafirînin, peyama we ji bo gelê Sûriyeyê yê ji hemû mezheb û olan re çi ye?**

Di vî çarçoveyê de gelek gef li me hatin xwarin ku wê min tesfiye bikin, tune bikin, name dihatin çandin û hwd.. lê ez bi vê projeyê bawer im tu kes nikare li min bandor bike û tirsê ava bike. Ji ber ya ku temsîla me dike ev hêz û ev proje ye. Xala din; Şerê ku li ser meday dijîtal û malperan tê meşandin, ev bi destê hin kesan tê kirin ku ji van malper û aliyan re pere didin da ku li hember me bixebitînin. Îro em dibênin ku herîî zêde balê dikşînin ser serokê eşîran dixwazin wan teşhîr bikin û bidin pêş. Nemaze; Bi zimanekî ku dibêjin tu Erebî hêzeke te heye, tu çima piştgiriya QSD'ê dike. Helbet me berê jî anî ziman ku projeya Rêveberiya Xweser projerya ku me û hebûna hemû netew, ol û nasnameyan temsîll dike ye. Ji lewra em tu girîngiyê nadin van dijîtî û şerên ku li ser medya civakî tên kirin.

Em amade ne li ser dezgehên ragihandinê yên hundir û derve derkevin û bêjin, projeya Netewa Demokratîk projeye demokrasî û nenavendîbûyînê ku tenê bi vê projeyê dikare Sûriyê ber bi çareseriyê ve bibe.



FENER



## Şer`i wê karibe berdêlên serdana ji Koşka Spî re bide?

**Idrîs Henan**

Piştî serdana serokê hikûmeta HTŞ ya defakto li Sûriyê Ehmed Şer`i ji Koşka Spî û hevdîtina bi Trump re, şîroveyên cihêreng û ecêb derketin. Defciyên desthilatê dunay gêjûmêj kirin ku qaşo vê serdanê cilika bin lingê QSD de kişandiye û insyatîf ji destê wê girtiye ku hevkariya wê bi Koalisyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ re bê mane bûye! Li djî nerîna şoşbanê vê rêxistina tundrewa a beşa Alqayîde, Abdulah Almuhêsnî ku rêkeftina hikûmeta HTŞ bi Amerîka re weke gavek siyasî ye şîrove hatin kirin. Li gorî Muhêsnî serdan bi fetweyekê bû hewceyek şerîetê û rêya ku destpotiyê tekûz dike meşrû kir. Lew re jî vê gavê berovajî şîrove dikin û li dijî heyînên demokratîk ên hundirîn bi kar tînin ku ji bona xwe weke skendalên ber bi lûtkeya destpotîzmê ve dibînin.

Ji bona ku naverok û niyetên hikûmeta defakto a HTŞ baş were fêmkirin, divê di serî de cihê ku dixwaze pê re têkîliyê çêke û niyetên herdu terefan werin zanîn. Her kes dizane ku DYE û bi taybet di serdema Trumpê bazirgan ku hikumraniya xwe li ser qezenc û istismarê daye avakirin, buhayê silavê jî distîne. Ji bona ku bi kesayetekî weke Elşer`i re rûne, divê berdêlên giran werin dayîn. Êdî dixwaze Şer`i bi xwe be yan jî piştevanên wî yên herêmî yên weke Siûdî Erebistan û Tirkiyê bin. A girîng dayîn û qezenca zêde ye. Tabloya Zêlênskî li ber çavan e çawa ew ji Koşka Spî der kirin û bi zor û keysbaziyê sererd û binerdê Ukranyayê xesib kirin. Êdî pirsa bingehîn a ku divê defciyên HTŞ ji xwe bipirsin ew e; Gelo Şer`i ji bo hevkariya bi DYE û Îsraîlê re wê çi buhayê bide?

Bersiva vê pirsê li ser bingeha normalîzekirina têkîliyan û qebûlkirina statuya Îsraîlê ya heyî tê dayîn. Derveyî vê çarçoveyê Amerîka deriyên xwe ji Şer`i û derdora wî re venake û ne jî derbasî cem xwe dike. Ji ber gomana wê jî bi kesayeta Şer`i û tevgera ku temsîl dike, di deriyê paşîn a Koşka Spî re derbasî hundir kir û weke sûcdarekî li hemberî xwe da rûnişkandin. Ne parfana Trump û ne jî tabloyên ku ji dîroka Sûriyê hatine dizîn karibûn bêhna karsazî û bazirganiya qirêj a li ser qedera gelên Sûriyê binixumînin. Piştî serdanê hat îdiakirin ku wê lihevkirinek ewlehî bi Îsraîlê re were îmzekirin. Gelo mijar tenê itîfaq an jî normalîzekirina têkîliyan û qebûlkirina statuyê û xweradestkirina ji îradeya Îsraîlê re ye? Şer`i dixwaze yekdestariya xwe bi piştgiriya herêmî û navneteweyî re xurtir û tekûztir bike. Ew jî mîna hemû rejîmên herêmê ku hebûna xwe dispêrin hevkariya bi DYE û Îsraîlê re. Bi wê yekê re jî hewl didin hebûna xwe rewa bikin û vîna gel paşguh û bê wate bikin. Tişta Şer`i û hikûmeta HTŞ ya defakto dike jî ew e. Rewatiya siyasî ya hundir ku bingeha rêveberiya dadwer û meşrû e, red dikin û xwe dispêrin derve. Nêzîkatiyên bi vî rengî û israra di wê kategoriyê de, niyeta vê rejîmê diyar dikin ku li ser şopên Baas berê xwe daye avakirina dewletek otorîter ya nû ya ku nasnameya Sûriyê ya pirreng û pirçandî red dike.

Di dawiyê de em bipirsin; gelo Şer`i dikare bi van gavan re rejîma xwe bi raya giştî bide qebûlkirin û wê karibe li hemberî parçebûna bineyên îslama tindrew ya HTŞ raweste? Gelo buhaya ku Sûriyê bide wê çi be? Heya kîjan radeya qanûnî Şer`i xwedî wî mafî ye ku dîroka Sûriyê bike diyarî û li derdorên otorîter ji bona yekdestariya xwe belav bike?